# RAPORA ÇALAKIYÊ YA NAVENDA ŞÊWR Û PIŞTGIRIYÊ

## SIBAT-TÎRMEH 2022

Kadın Zamanı

Kadın Zamanı Derneği



Rapora me ya Navenda Şêwr û Piştigiryê tevî; komîsyonên me yên piştgiriya derûnî-hiqûqî û stendina serîlêdanan bi awayekî kolektif hatiye amadekirin.



# NAVEROK


## DESTPÊK

## 1.SERÎLÊDANÊN KU LI NAVENDA ŞÊWR Û PIŞTGIRIYÊ BÛNE

-Tundiya mêran ya li ser jinan

## 2.RAGIHANÊN NAVENDA ŞÊWR Û PIŞTGIRIYÊ

-Komisyona Piştevaniya Derûnî: Rewşa Başiyê û Ji Tundiyê Xelas bûn

-Komisyona Hiqûqê: Di Warê Têkoşîna Li Dij Tundiyê Dijwariyên ku Em Dibînin

# 3.ENCAM

""Li hember cîhaneke newekhev, ligel azadiyê em li Dema Jinan in"

Weke Komeleya Dema jinan tundiya arasteyî jinan û newekheviya zayendîtiya civakî bingeha qada têkoşîna me ava dike. Di vê têkoşînê de em girîngiyê didin bergeha jinê, tecrûbeyên tevgera jinê û rêgezên femînîst dipejirînin. Di vê çarçoveyê de em di navenda xwe ya şêwr û piştgiriyê de hewl didin ku bila jin tundiya ku rûbirû mane bi rehetî bikaribin vebêjin, dema ku di derheqê jiyana xwe de biryar bidin tenê hîs nekin, li hember tundiyê tevî hêza xwe têkoşînê kişf bikin û derdoreke ewle ava bikin. Heke jin li hember tundiyê xwe tenê hîs bikin jî em bawer dikin ku tundî ne takekesî ye, pirsgirêkeke pergalî ye ku ji patriyarkayê ava bûye û newekeheviya zayendîtiya civakî jî di xala derketinê ya hemûyan de cih digire.

Em li gor naverokên daxwazên bi piraniya jinên ku serî li navenda me ya şêwr û piştgiriyê didin rûbirû hevdîtin pêk tînin, em giringiyê didin vegotina serboriya wan a tundiyê û di vê bergehê de pêdiviyên wan diyar dikin. Di hin rewşên mîna pandemî an jî rewşên taybet yên jinan em bi telefonê hevdîtina yekem pêk tînin û di derheqê derketina ji çerxa tundiyê agahiyan didin. Di hevdîtinên ku pisporên me yên pirsgirêkên civakî û li gor pêdiviyê derûnnasên me yên dildar cih digirin nepenîtî û ewlekarî bingeh e. Em bawer dikin û difikirin ku hêmana bingehîn ya piştigiriya jinan nepenîtiya parvekirina tecrûbeyan e.

Li gor pêdiviyên ku di encama hevdîtinan de hatine diyarkirin, ji jinên ku bi navenda me dişêwirin ji bo piştgiriyên civakî, derûnî û hiqûqî li hundir û derva navendê de em ji yekeyên guncav re beralîkirinan dikin. Di warê beşdariyê de em giringiyê didin pêvajoya gihaştina piştevaniyê û jinên ku gihaştina navenda me têkiliyê de dimînin.

Piştî qeyrana kûr ya pandemiya covid-19ê ava kiriye di sala 2021an de bi biryara serokwezîrî bi awayekî derqanûnî fesihkirina Peymana Stenbolê ya di derheqê pêşîlêgirtina tundiya hundir malê û tundiya li ser jin û zarokan peymana herî bibergeh û navneteweyî ye û piştî erêkirina vê biryara derhiqûqî tundiya li ser jinan zêdetir faîl jî wêrektir bûn.

Ev pêvajo li hember saziyên jinan bi dozên girtinê, politikayên zextê yê li ser saziyên sîvîl, di pêvajoya ji çerxa tundiyê xelasbûnê de bi astengkirinên azadiyên vegotinê yên li ser rêxistinên sîvîl domiya. Daxwazên şêwr û piştigriyê yên li navenda me tên kirin nîşanî me da ku tundiya arasteyî jinan yek ji wan pirsgirêkên herî mezin ya vî welatî ye, digel polîtîkayên zextê yên ku tên meşandin di warê zimanê hevpar ên ji hêla sazî û rêxistinên jinan re bûye bersiv û xwedî li jiyana xwe derdikevin.

Weke Komeleya Dema jinan li gel vê yeka feraseta heyî ya ku ji rewakirina tundiyê re dixebite û li dij azadiya jinan tê pêşxistin em di warê xwedîlêderketina jiyanên xwe israrê dibînin û ji bo tevkariyê hewl didin.

Em di vê baweriyê de ne ku tora piştgiriyê ya ku ava bûye di serdemên polîtîk, aborî û qeyranên civakî de jî piştigriya jinan hebûna xwe dimeşîne û mezin dike.



# SERÎLÊDANÊN KU LI NAVENDA ME YA ŞÊWR Û PIŞTGIRIYÊ HATINE KIRIN

Rapor, analîzên bingehîn ên serîlêdanên di bin banê navenda me ya şêwr û piştgiriyê ya komeleya me ku di navbera dîrokên 1ê sibata 2022an û 31ê tîrmeha 2022an de hatine kirin di nav xwe de dihewîne. Di pêvajoya şeş mehane de me dît ku jin di gihaştina piştgiriyên derûnî û hiqûqî gelek zehmetî dikêşin.

Serîlêdanên ku ji alî pisporên civakî ve bi hurgilî  tên stendin daxuyaniyê jinê bingehîn e û bi vî awayî peyitandina pêdîviyan tê kirin. Bi armanca kirina van analîzan û qeydkirina pêdiviyên peyitandî formên ku ji alî me hatine amadekirin li gor taybetmendiyên xweser ên jina serîlêder tê tijîkirin. Bi saya formên ku me di serîlêdanên heta niha de bi kar anîne, me pêdiviyên jinên serîlêder li gor taybetiyên wan mîna temen, rewşa aborî û herêmê dabeş kir.

Serîlêdan bi rêya telefon, e-name, medyaya civakî, malper û bi awayekî rûbirû pêk hatin. Di encama hevdîtinên serîlêdanên ku li navenda me hatine kirin di çarçoveya şêwirmendî, agahdarkirin û pêdiviyan tên bêralîkirin.

Di serîlêdanên ku hatine kirin daxwaze yekem weke daxwaza derûnî hat peyitandin. Pêdiviya piştgiriya derûnî hem ji bo pênasekirina tundiyê hem jî ji bo derketina çerxa tundiyê daxwaza bicihanîna başiya deruniya hewcedar bû.

Jinên ku ji bo piştgiriya hiqûqî serî li navenda me dane jî di serî de ji bo sûdwergirtina pêşgiriyên parastinê yên ku ji qanûna bi hejmara 6284an derbas dibe daxwaz dikin. Hat dîtin ku daxwaza pêşane ya jinên ku dixwazin doza hevberdanê vekin pêşgiriya parastinê ye û bêyî parastina hewcedar nexwastin dozê vebikin. Bi rastî jî hat dîtin ku di daxwazên piştgiriyên hiqûqî de gihaştina edaletê ya jinan gelek zehmet e; Jin vegotin ku ji saziyên giştî piştgirî û agahiyên hewcedar bi dest nexistin.

Jinên ku ji bo piştgiriya aborî serîlêdan jî bêhtir jinên bê dahat û ên ku ji xizmetên piştgiriya aborî ya saziyên giştî sûd wernegirtine. Bi taybetî jî ragihandin ku di bergeha qanûna 6284an serîlêdanên ku li amirtiyên mulkî yên bajar û navçeyan kirine bê bersiv mane, ji ber ku piştgiriya aborî pêk neanîne di warê ji mala ku tê da bi tundiyê rûbirû dimînin nikarin derkevin û zehmetî dibînin û piştgiriya aboriya ku didin jî li gor şert û mercên îroyîn gelek kêm e.

Motivasyona bingehîn a daxwazên piştgiriya civakî jî di derheqê dozên ku jin ji failên tundiyê re gilîdar in, di wê fikarê de bûn ku piştgiriya jinan bandor li pratîkên darizandinê yên jinan dike. Ev rewş xema darazê ya bêalî û adilane bîne ziman jî nîşan da ku baweriya jinan bi vê qadê jî heye.

Daxwaza stargehan li gor daxwazên din kêm be jî, hat dîtin ku xizmetên stargehan ên ji alî saziyên giştî ji bo jinên ku bêmal kêm e û merc xerab in. Jin vegotin ku di derheqê rê û rêbazên xizmetên stargehên ku ji alî ŞÖNİMê ve tên pêkanîn û di derheqê pejirandina zarokan ji bo stargehan ne agahdar in. Ji ber vê yeke jî naxwazin serî li stargehan bidin.

Tevî vê yekê di nava serîlêdanên ku ji saziyên cuda hatine hejmara jinên ku zimanê wan ê zikmakî kurdî ye zêdetir bû. Jinên ku zimanê wan ê zikmakî kurdî ye vegotin ku, digel di warê tundiya arasteyî jinan toreke ku ji bo piştgiriyê serî lê bidin tune ye jî, gihaştina wan a materyalan jî gelek sînordar e.

Pirsgirêka ziman ne tenê di warê têkoşînê bi tundiyê re, di warê gihaştina agahî, tenduristî û perwerdehiyê jî astengek e. Jinên kurd ên ku di derheqê tenduristiya jinê de nikarin bigihêjin agahiyên rast, nikarin bi laşê xwe re têkiliyê deynin û pirsgirêkên xwe yên tenduristiyê bînin ziman.
Di heman demê de jinên ku bi tundiyê re rûbirû mane li qereqol, dozgerî û dadgehan de xwe nikarin baş îfade bikin, ji xizmeta wergêriyê nikarin sûd wergirin.

Ji ber vê yekê komeleya me bi jinên ku pêdiviyan bi zimanê zikmakî heye hevdîtinan pêk anî, hem di ragihandina tecrûbeyên tundiyê hem jî agahiyên di qadên cuda bi zimanê xwe bihîstin. Bi vê xebatê me rê li ber mexdûriyeta duyem girt û me hewl da ku afirandina çareseriyê bo jinan hêsantir be.

Herwiha piştî xebata ankêtê ya me bi Google formê pêk anî û xebatên qadê, seriya podcastê ya bi kurdî weşand û li gor ziman û mijarên ku tên xwastin em hê jî naverokên bibergeh diafirînin.

Bi jinên serîlêder re li gor rewşa wan a hatina navenda şêwr û piştgiriyê me hevdîtin rûbirû pêk anîn. Bi jinên ku derveyî Stenbolê an jî ji ber sedema ewlehiyê nedikarîn bigihêjin komeleya me jî me bi rêya telefonê hevdîtinan pêk anî û beralî saziyên taybet û giştî yên wî bajarî kir.

Di encama hevdîtinên bi hurgilî hatine kirin me bi piranî li baro, şaredarî, yekeya pêywendîdar ya Wezareta Polîtikayên Civakî û Malbatê, stargehên ŞÖNİMan û saziyên din ên sîvîl beralîkirin.

Jin bi xwe serî li van saziyan daye û li gor rewşa pêdîviyê komeleya me tevlî şopa pêvajoyê bûye. Di vê çarçoveyê de di derheqê piştgirî û paşragihandinan xwedî agahîbûyîn, em ji bo berfirehkirina politikaya navenda me û serîlêdanên ku dê bên kirin girîng dibînin.

Ji ber ku piştgiriya derûnî û hiqûqî di nav daxwazên herî bingehîn ên ku ji komeleya me re tên dildar û endamên me encamên xebatên di vê qadê de pêk tên dikin rapor, ji saziyên jinan re peşkeş dikin. Em hevî dikin daneyên ku hatine berhevkirin di warê têkoşîna li hember tundiyê tevkariyek be.

## PIŞTGIRIYA DERÛNÎ:
## Ji Tundiyê Xelas bûn û Rewşa Başiyê

Em jinên ku xwe digihînin komeleya me piştî hevdîtinên rûbirû rewşên wan ên taybet jî li ber çavan digirin û pêdîviyên wan tespit dikin û ji bo piştgiriya derûnî beralî komisyona me dikin. Navenda me ya piştgiriyê ku bergeha jinê bingeh digire ji derûnnasên ku di saziyan de cih digirin û di tora piştigirya derûnî de cih digirin beralî dikin. Em bi jinên ku li tora piştgiriya derûniya navenda me tên beralîkirin hevdîtinan rûbirû an jî online dikin.

Hevdîtinên online ên piştî pandemiyê kete jiyana me di warê piştgiriya derûnî de bi taybetî jî ji bo jinên ku rîska wan ewlehiyê heye dibe vebijêrkeke nû, ji bo jinên ku derfeta hevdîtina rûbirû tunegihaştina mekanîzmayên piştgiriyê hêsantir dike. Em di van hevdîtinên piştgiriyên derûnî girîngiyê didin ewlehî û taybetiyan. Hevdîtin ji alî xebatkarên karen civakî û derûnnasên ekîba me ve tên şopandin.

Piştgiriya derûnî di xala rêbazên dûrketina jiyana tundiyê û hîssiyatên mîna xem, bêçaretî, bêewlebûn, fedî, tirs û tenêtiyê ku piştî tundiya paşerojê an demeke nêzîk de jiyane ciheke girîng digire. Komeleya me ji bo ku xizmeta piştgiriya derûnî ewletir û tenduristtir bijî di serî de bi derûnnasan re torekê ava kir. Derûnnasên di nav vê torê de cih digirin hem xwedî feraseteke jinê ne hem jî xwesteka pêşketina vê qadê bo wan bingeh e.

Bi armanca piştgiriya wan a vê qadê em xebatên supervizyon û perwerdehiyê li dar dixin. Em van xebatan digel ku di nav navenda xwe ya şêwr û piştgiriyê dimeşînin, di heman demê de jî Weqfa Piştgiriya Jinan ya Mor Çatıyê û saziyên din ên ku xwedî heman tecrûbeyan in piştgirî distînin.

Di hevdîtinên ku tên kirin ji pêşdarazîyê dûr çîrokên tundiyê yên jinan û heyîna guhdarvanên ku piştgiriya jinan bingeh digire bandoreke girîng e. Di vî warî de em dixwazin hişmendiyekê ava bikin.
Jin dema ku behsa tundiya ku duçar mane dikin di serî de xwe sûcdar dibînin an jî behsa nizaniya sedema vê tundiyê dikin. Ji ber vê yekê vedibêjin ku ferq nekirine bêtişta hatiye jiyîn tundî ye an na,ji ber ku tundiyê nedikarîn pênase bikin bertekek jî nîşan nedane. Jinên ku di zarokatiya xwe de bi tundî û îstismarê re rûbirû mane anîne anîne ziman ku xwe sûcdar hîs kirine, weke jinekê hê jî bi tundiyê re neçûne serî û ji kûr ve bandor li jiyana wan kiriye. Vegotine ku "paşerojê de jî, niha jî di derheqê tiştên ku jiyame hemû sûc ya min e".

Jinên ku di serdema xwe ya zarokatiyê de bi îstîsmara aborî, hestiyarî, zayendî û fîzîkî re rûbirû mane û ên di serdema xwe ya gihiştî de bi tundiyê re rûbirû mane anîne ziman ku pirsgirêkên tendurîstî, jiyanî û sewsî bûn jiyane.
Piştî trawmayên ku ji ber tundiyê derketine holê, di serî de peyitandina jin ne sedema tundiyê ne û bi taybetî jiyana îstîsmarî ya serdema zarokatiyê de hatiye jiyîn, tundiyê ne zarok ne mezinek bi tu awayî heq nakin, di warê têgihiştina pirsgirêkên xwe piştgirî daye.

Di derheqê pirsgirêkên bingehîn ên tên vegotin, bi berdewamiya piştgirî û rêbazên çareseriyê ji bo avakirina stratejiyên parastina xwe, em pêşkêşkirina rewşa başiya derûnî ji xwe re dikin armanc. Lê belê mîna ku me bi hevdîtinên jinan re ceriband, di warê civakî derdora bêewle ya jinan re hatiye rewakirin pêkanîna rewşa başiya derûnî dijwar dike. Bi taybetî bi awayekî derhiqûqî biryara fesihkirina Peymana Stenbolê û newekheviya zayenda civakî ya kûrtir bûye xwe dispêre jiyana giyanî ya jinan, di bikaranîna mekanîzmayên xelasbûna ji tundiyê ewlehiya ji bo pêşerojê jî kêm dike.

## PIŞTGIRIYA HIQÛQÎ:

## Di Warê Têkoşîna Bi Tundiyê Re Dijwariyan Ku Em Dibînin

Pandemî ji bo navenda me ya şêwr û piştgiriyê ku di serdema pandemiyê de vebûye zehmetiya yekem bû. Qedexekirinên derketina derve û bergiriyên ji bo li malê mayîn ji bo gihaştina saziyan li ber jinan astengeke mezin bû. Ji ber hincet nîşandana pandemiyê nepejirandina serîlêdanên ku li saziyên fermî hatine kirin, kiryarên darizandinê yên ku di vê pêvajoyê de hatine sekinandin, di warê deregmayîna stendina biryaran bûye hincetek û hesta bêçaretî û bêwelehiyê li jinan bar kiriye.

Me çavderî kir ku bi newekheviya zayenda civakîya ku piştî pandemiyê kûrtir bû, ji bo ku jin ji çerxa tundiyê derkevin bûye astengek. Piştî salekê tijî astengî û pandemiyê tevî fesihkirina Peymana Stenbolê di warê pêkanîna mekanîzmayên ji tundiyê parastinê nexwestek û hêdî bûnaji alî dazbend û darazê bêewlihiya jinan kûrtir kiriye.


Jin ji bo ku ji çerxa tundiyê û ji şert û mercên bêewle derkevin serî li navenda me ya şêwr û piştgiriyê dane. Tecrûbeyên di derehqê serîlêdanên ku li mekanîzmayên dadî hatine kirin û bê encam mane, di warê xwe îfadekirinê de jinan di dudiliyê de hiştiye û di warê gihaştina çareseriyê de hêvîya wan şikandiye. Jin vegotin ku li saziyên fermî nehatine guhdarkirin, giliyên wan bêencam mane û wezîfedarên fermî wan xwestiye bişîne ba mêrê tundîker. Ligel vanan alîkariya ku divê ji alî saziyên giştî ve werin dayin û di warê piştgiriya stargehan pirsgirêk jiyane. Ji ber ku çareseriyek nedîtine mecbûr mane ku tevî zarokên xwe vegerin çerxa tundiyê.

Di vê peywendê de di warê kiryarên Peymana Stenbolê û qanûna bi hejmara 6284an de israra ku nîşan didin weke tundî û bêhêvî bûn li jinan vegeriyaye.

Li gor çavderiyên me jinên ku serî li navenda me ya şêwr û piştgiriyê didin dibêjin ku em ê cidî neyên girtin. Sekn û feraseta sûcker û ne cidî yên saziyên giştî ya li hember jinan di warê tundiyê de dibe sedem ku jin xwe berpirs bibînin. Jin dibêjin ku tundiya em dijîn weke ku em mijarê mezin dikin an bertekeke zêde tê nîşandan.


Di encamê di peywendên mekanizmayên hiqûqî de tecrûbeya me ya navenda şêwr û piştgiriyê, daye nîşandan ku nasîna newekheviya zayenda civakî û tundiyê, bingehstendina wekheviyê û tolerans nîşan nedayîna ji tundiyê re, di mijara hevdîtinan de pisporî gelek girîng e. Her çiqas hebûna qanûnê ji bo jinan parastinekê ava bike jî dûrbûna fikara wekheviya zayendiya civakî yên ku qanûnê pêk tînin, diyarkera bingehîn ya derfetên ji tundiyê xelasbûnê ya jinan e.

## Li gor daxwazan rêjeyên serîlêdanên ku hatine kirin




# SERJIMÊRÊN ME


## Çawa gihaşt me?




## Navenda me ya şêwr û piştgiriyê ji ku bihîst?




## Rewşa aborî ya serîlêderan



# ENCAM

*"Cîhaneke din ya bê tundî gengaz e"*

Navenda me ya şêwr û piştgiriyê ji çer ku dest bi xebatê kiriye di her serîlêdanê de tecrûbeyek bi dest xistiye û hem tevî jinên Dema Jinan hem jî bi rêxistinên ku li dij têkoşîna tundiya li ser jinan bi hev re û di parvekirinekê de ne. Em dizanin ku ceribandinên me û baweriya me ya ji holê rakirina tundiyê tevkariyeke mezin li hemû xebatên me dike.

Pêdiviyên ku piştî serîlêdanan hatine diyarkirin bi hewldaneke mezin ya endam û dildarên me nîşan didin, bilez tê başkirin. Em li hember mêrên ku bi biryarên daraza mêr-dewletê wêrektir dibin, kêliyekê be jî dev ji têkoşîna xwe ya jinan ya birêxistî bernadin û ji bo ku jin, LGBTI+ bi ewle û bêtundî bijîn, piştevaniya xwe bihêz dikin.

Komeleya Dema Jinan



Kadın Zamanı Derneği
*Komeleya Dema Jinan*
*Women's Time Association*

Malper: www.kadinzamani.org
Telefon: 0542 602 69 62
Mail:info@kadinzamani.org
Twitter: @kadinzamanider
Facebook: @kadinzamanidernegi
İnstagram: @kadinzamanidernegi